# Hikûmeta Eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê

22.05.2020
Rûpela 1 ji 2yê

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

**Danxuyandina Çapemenîyê -**

## Ji ḥikûmeta eyaletê deh pêşnîyazên demkî yên bibizav ên ku aborîyê û mezinbûnê xurt bikin

**Serekwezîr Laschet: Divê mezinahîya bernameyên biheweskirina bibandor ên aborîyê bi kêmayî 120 milyar Euro be – Bonûsa malbatê divê bi miqdarê 600 Euroyî be.**

**Wezîrê aborîyê Pinkwart: Ji derketina bi bilez û bi awayekî dewamker derketina ji krîzê bi mezinahîyeke mezin – ji bo nûkirina welêt karsazîyên nûkirina hercarî, jimarîbûn û parastina av û hewayê bên kirin.**

**Hikûmeta eyaletê van dide zanîn:**

Aborî, ji bipaşîhatina Şerê Dinyayê yê Didoyê ve krîza xwe ya herî mezin dibine: Wek hemûyê Elmanyayê, eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê jî ji ber şofa koronayê gelek xerab ket. Ji bo karina bi krîzê û ji nû ve bi lez dana destpêkirina aborîyê ji federale, eyalete û Yekîtîya Ewrûpayê destekên giring divên. Hikûmeta Eyaletê, wek bernameya nûkirina ber bi Elmanyayê û Bakurê Ren-Vestfalyayê ji bo xurtkirina aborî û mezinahîya bandor li ser wan bê kirin 10 pêşnîyazên bizavker pêşkêş dike:

Serekwezîr Armin Laschet: “Em dixwazin bi Hikûmeta Federal û Yekîtîya Ewrûpayê ye bernameyeke nûkirinê ava bikin û ji bo nûkirinê hêzeke ji dil a bizavker ava bikin. Ḥikûmeta eyalete ji bo pakêteke bibandor a biheweskirina ji bo aborîyê û nûkirinê di seranserê welêt de bi kêmayî texmîna pêdivîya bi 120 milyar Euroyî dike. Di rewşa heyî de, nemaze di her astî de li gora pîlankirina aborî ya dema navîn birêvebirina hemû xizmetên gelêrî û xerckirinan giring e. Ev, nexasim ji bo beledîyeyan di rewacê de ye – ew karsazên herî mezin ên gelêrî ne. Malbat, ji ber ku di hefteyên paşîn de xwandingeh û zarokxane hatine girtin mecbûr mane hin barên taybet hilgirin. Ji ber vê yekê, em pêşnîyar dikin ku ji bo dilxweşkirina zarokan û biheweskirina xerckirina taybet carekê bi tenê serê zarokê 600 Euro bonûsa malbatî bê dayîn.”

Wezîrê Aborîyê Prof. Dr. Andreas Pinkwart: “Eger em bixwazin ji krîzê xurttir der bikevin, divê em vêga ji dil û can tevbigerin. Ev nûbûnên bilez û di heman demê de bibandor û xurt bi nehiştinên ji bo parastina av û hewayê yên dewamkir ên du qat feyde didin dikare bibin. Kêmkirina bacê û sermîyanê bêtir mezinbûnê dikarin bibin sebeb ku şîrket hêza xwe xurttir bikin û bi bijimarîbûnê taqek û jêdera xwe beredayî xerc nekin û alîkarîya karsazîyên dostê av û hewayê pêk bên. Ji alîyê av û hewayê ve bizava nutr û jimarî divên procektên jêrzemînê yên ji bo berhemanîna sibêrojê bi awayekî mezin bên bipêşvebirin. Prosedurên erêkirinê yên bilez û tevlî burokrasîyê netevlîhev, hînkirina herî baş û nûbûna her car û ji bo parastina av û hewayê biheweskirinên mebestkirî, dê ji bo mezinbûna dewamkir û nû xurtkerên herî giring bin. "

Hîmê 10 pêşnîyazên bizavker ên ḥikûmeta eyalete, pêşnîyazên ji enstîtuyên lêkolînê RWI û IW-yê hatî ne.

Hûn dikarin raporta zanayên li ser enstîtuyên aborîyê û 10 pêşnîyarîyên demkî yên bizavker ji girêdanka jêrîn daxînin:
www.wirtschaft.nrw/pressemitteilungen/10-Impulse-Konjunktur

***Ev danxuyandina çapemenîyê dikare di înternetê de ji vê navnîşana înternetê ya ḥikûmeta eyalete jî bê dîtin www.land.nrw.***

***Danzanîna ji bo parastina zanyarîyên bi çapemenîya civatî re têkildar***